



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 38**

# 4 - Selaheddîn û avakirina Dewleta Eyûbî

## Dijberiya kurdî - turkî:

Pir nîşane û dawerên wê yekê hene ku *Selaheddîn*, tevî bav û birayên xwe dixwastin desthilatdariya Misirê bi awayekî serbixwe ji *Dewleta Zengî* bikin. Misir dewleteka mezine, hejmara gelê wê pire û berhemên wê jî pirin. Rewşa wê ya geo-siyasî jî pir girînge û heyam jî heyama hêza leşkerî bû. Wek nimûne, Zengî bi xwe jî efserekî leşkerê Selcoqî bû û bi hêza leşkerî mîrîtiyek li Mûsilê avakiribû û di pey ra veguherî û bû seltenet. Ji lewra, çima *Eyûbî* jî dewleteka xwe avanekin, madem serdariya Misirê kete destê wan û hêza wan a leşkerî jî heye?

Va ye hin nîşane û dawer li ser bîr û boçûnên *Selaheddîn* û malbata wî ber bi avakirina dewletê va:

**1-** Gava *Selaheddîn* li Misirê bû wezîr, bavê xwe û kesên din ji malbata xwe anîn Misirê û di astên leşkerî û rêveberiyê yên girîng da bi cih kirin, erd û zeviyên mezin dan wan.

**2-** *Selaheddîn* peywendiyên pir baş li gel *Xelîfeyê Fatîmî El-Ȟadid* danîn, bi awayekî pir baş û nazik bi gelê Misirê ra da û stand, bac û xûkên dewletê ji ser wan sivik kirin û wisa hemiyan jê hezkir.

**3-** Di sala 566-ê goçî (1171-ê z.) da sultan *Nûreddîn* ferman da ku *Xîlafeta Fatîmî* ji holê bê rakirin. Ji bo vê yekê, *Selaheddîn* lêborîn xwast û got ew bi tirs û fikare ku alîgirên *Fatîmiyan* şoreşê hildin. Wî didît ku hebûna *Xelîfeyê Fatîmî* yê jar û lawaz, wî ji *Nûreddîn* diparêze, keys û derfeteka baş dide wî ku kelîja xwe xurt bike[1].

**4-** *Selaheddîn* desthilata xwe li Misirê xurt kir, hemû bizav û hewldanên *Fatîmiyan* ku *Xîlafeta Fatîmî* ji nû va vejînin têkbirin. Van kesan bi dizî û nehînî name ji *Firengan* ra dişandin, ji wan dixwastin ku êrişî Misirê bikin, daku leşkerê *Selaheddîn* xerîkî şer bikin û wisa bikaribin dek û dubareyên xwe pêkbînin[2].

**5-** Di sala 569-ê goçî (1174-ê z.) da *Selaheddîn* birayê xwe yî mezin *Tewranşah* şand ku welatê El-Nûbeh (başûrê Misirê û bakurê Sûdanê) têxe bin

---

[1] Muhemmed Suheyl Teqoş: Dîroka Fatîmiyan, rûpel 523.
[2] Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 9/390-391.

desthilata xwe, daku ji bo wî kûraniyeka strategî be, heger hat û *Nûreddîn* ji bakur da êriş anî ser wî[3].

**6-** Di sala 569-ê goçî (1174-ê z.) da dîsa birayê xwe yî mezin *Tewranşah* şand ku welatê Yemenê dagîr bike. Armanc dîsa ew bû ku ji dewleta xwe ra kûraniya strategî pêkbîne, heger hat û *Nûreddîn* êriş bi ser wî da sepand. Her wisa jî sûd û mifayê ji berhemên Yemenê bigire û rêyên bazirganiya deryayî yên Deryaya Sor têxe bi desthilata xwe[4].

Ji ber wê, gumanên rêveber û serbazên Turkumanan mafdar bûn û ev agahdarî hemû digihandin *Nûreddîn*. Wisa gumanên *Nûreddîn* xurt bûn û êdî dest bi sîqilandin û navtêdanan kir ku rêyan li *Selaheddîn* teng bike, daku asêbûna xwe aşkere bike û ew jî vê asêbûnê bike behane ku wî ji wezîfedariyê bide aliyekî û tineyî bike. Dîroknas *Ebo Şameh* nivîsandiye:

"**Gava nûçeya mirina *Eseduddîn (Şêrkoh)* û standina wezaretiyê ji aliyê *Selaheddîn* va gihîşte wî, û çawa gelê Misirê ji *Selaheddîn* hez dike, gelekî xeyidî û dilteng bû, û got, çawa *Selaheddîn* tiştekî wisa bêyî destûra min dike?! Li ser vê pir nivîs nivîsandin, lê *El-Melik El-Nasir (Selaheddîn)* guh neda peyvên wî, lê ji bin fermana wî jî derneket**"[5].

*Selaheddîn* pir aqilmend û bi hedan û sebir bû, dîtin û boçûnên bavê wî, jêra rêber û delîl bûn û wisa xwe ji dijberiya yekser bi *Nûreddîn* ra diparast. Wî ev rewşa xwe ku *Nûreddîn* rê li wî pir teng dikir bi vî awayî aniye ziman:

"**Ez li ser peyvên wî yên mîna devê kêran û pozê derziyan pir bi hedan û sebir bûm. Kesekî ji peyayên wî nikarîbû tiştekî li ser min bigire û bike sûc. Wî bi xwe jî pir hewlda ku kêmasiyekê bibîne û li ser min bihejmêre, lê nikarîbû. Di name û axaftinên xwe da tiştên wisa digotin ku tikes li ser sebir nake, daku ez xwe şaş bikim û bêm guhartin. Û ev bibe behaneyek û were şerê min bike. Lê min nehîşt ku ew bi ti awayî bigihîne armanca xwe**"[6].

## Avakirina Dewleta Eyûbî:

Dema *Nûreddîn* biryar girt ku êrişê bibe ser Misirê, *Selaheddîn* civîneka berfireh lidarxist ku bavê wî *Eyûb*, xalê wî *Şehabeddîn El-Harimî*, mîrên Eyûbiyan û hin kesên bilind ji rêveberiya leşkerê lê beşdar bûn; pend û rawêj li ser vê mijarê ji wan xwast. Ji nav beşdaran biraziyê wî *Teqiyeddîn Omer* (kurê *Şahînşah*, birayê *Selaheddîn*) rabû ser xwe û got: Heger *Nûreddîn* bi ser me da were, emê şerê wî bikin. Hin Eyûbiyên din jî piştgiriya wî kirin. Hîngê *Necmeddîn Eyûb* (bavê *Selaheddîn*) rabû ser xwe, dijûn bi wan dan, ew rezîl kirin û li dijî bîr û baweriya wan rawestiya. *Eyûb* gelek zana û aqilmend bû. Ji *Teqiyeddîn* ra got: Li cihê xwe rûne û dijûn bi wî dan; vegeriya ser *Selaheddîn* û jêra got: Ez bavê te me û ev jî xalê te *Şehabeddîn*'e. Kesek ji van, ji me bêhtir xêra te naxwaze. Heger ez û xalê

3 Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 9/388.
4 Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 9/388.
5 Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 1/440-441.
6 Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 1/442.

te, em *Nûreddîn* bibînin, emê ji hespên xwe peya bibin, emê axa nav destên ramûsin û heger fermanê bide me, em serê te bibirin, emê wisa bikin. Heger em wisa bikin, hîngê wê kesên din çawa bin? Ev welat mal û samanê wî ye û tu li vir niwênerê wî yî. Heger xwast te bide aliyekî, tenha pêwîste ku biryara bidawîbûna serdariya te bi xizmetkarekî xwe ra bişîne û kê bixwaze li cihê te deyne.

Paşê *Eyûb* ji beşdaran ra got: Êdî belav bibin! Em alîgir û koleyên *Nûreddîn*'in, ew çi bixwaze dikare bi me bike, êdî herin!. Helbet, hin kesên beşdar ji *Nûrddîn* ra nivîsandin, çi di civînê da derbas bû. Di pey ra *Eyûb*, bi tenha serê xwe bi *Selaheddîn* ra ma û jêra got:

"**Kurê min! Tu hên geda û celebî, te dibistanên zanînê hên derbas nekirine (yanê tu nezanî, zanîna te hên kême). Tu ewqas kes dicivînî û ji wan ra tiştê dilê xwe aşkere dikî. Heger *Nûreddîn* bibihîse ku tu nahêlî ew derbas vî welatî bibe, ewê girîngiyeka mezin bide vê mijarê. Heger bi ser te da were, tu yê ji van leşkeran ti kesî li aliyê xwe nebînî û wê te bispêrin wî. Lê niha, piştî vê civatê, wê ji wî ra binivîsînin û peyvên min bigihînin wî**"[(7)].

*Eyûb* ferman da *Selaheddîn* ku nameyekê ji sultan ra binivîsîne, jêra bêje ku tu ji wî ra guhdar û sernermî û ne pêwîste ku ew bi xwe were. Tenha hewce ye ku ew xizmetkarekî xwe bişîne, werîsekî têxe stûyê min û min bibe. *Eyûb* ji kurê xwe ra mijar şîrove û avêne kir ku bi vî awayî, sultan wê bi derûnî rihet bibe û ewê bi pir tiştên din yên girîngtir xerîk bibe. Rewş zû tê guhartin û Xweda tiştên ku em nizanin diafirîne. Di pey ra got: **Bi navê Xweda! Heger *Nûreddîn* şekirqamûşekî jî bixwaze, ezê nehêlim, ezê şerê wî bikim, yan jî bême kuştin**"[(8)].

*Selaheddîn* bi pend û rawêja bavê xwe kir û *Nûreddîn* dest ji êrişa ser Misirê berda. Piştî demeka kurt, *Nûreddîn* di sala 569-ê goçî (1174-ê z.) da wexer kir û kurê wî El-Salih Îsmaîl bû sultan. Ew hên 11-salî bû, mezinên rêveberên leşkerê Nûreddîn dest dane ser desthilatdariyê, *Selaheddîn* ji girtina biryaran bidûrxistin, şerrawestan li gel *Firengan* pêkanîn û êdî mîrên *Zengiyan* li ser desthilatdariyê şerê hev kirin. *Seyfûddîn Gazî Bin Qutbeddîn Mewdûd* herêma Cezîrê li Sûriyayê û rojavayê Kurdistanê dagîr kir. *Selahddîn* nameyek ji sultan Salih û rêveberên mezin ra nivîsand, mede û lome ji wan kirin, çima welat naparêzin û arîkariya wî naxwazin ku bergiriyê di ber welêt da bike[(9)].

---

[7] Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 9/368. Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 2/227-229.
[8] Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 9/368. Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 2/227-229. El-Meqrîzî, Kîtab El-Sulûk, C1, Q 1/70.
[9] Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 9/396.




Di sala 570-ê goçî da, piştî ku hin mezinên mîrên Şamê jêra nivîsandin, *Selaheddîn* bi leşkerê xwe va berê xwe da Sûriyayê. Di sala 570-ê goçî da kete Şamê, arîşe û pirsgirêkên welêt bi rêxistinkirin, ji êrişên *Firengan* parast, hin şer li dijî hevpeymana *Zengiyan* pêkanîn û zora wan bir. Seranserê Sûriyayê ji dest wan girt û tenha bajarê Helebê ji Salih ra hêşt, ji bo xatirê xwîşka Salih Îsmaîl ku ji bo vê yekê, bi serdanî hatibû ba wî. Êdî pere bi navê xwe dan duristkirin û di pey ra *Xelîfeyê Ebbasî El-Mustedî' Bi Emrîllah* lexema "*sultan*" û lexema "*El-Nasir*" da ser wî. Bi vî awayî, *Selaheddîn* dewleteka mezin damezrand, ji rojhilat, ji Şengal, Mûsil û Hewlêrê (Erbîlê) da bigire heya bi Tûnis li Rojava û ji bakur, ji Farqîn û Anatoliyayê da bigire heya bi Yemen û Sûdanê li başûr([10]).

[10] Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 2/329, 340. Kineth Sitton: Dîroka Şerên Xaçeperestan, rûpel 225. Ibin Şeddad, El-Newadir El-Sultaniyeh, rûpel 50-52. Ibin El-Esîr, El-Tarîx El-Bahir, rûpel 181. Mihemed Emîn Zekî, Dîroka Dewlet û Mîrîtiyên Kurdan di heyama Îslamî da, 190-193.